

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

2- Dema Gruba Xebatê jî tê de, ji bona TEVKURDÊ 4 doz hatin vekirin. **Doza 1-emîn** ji aliyê dadgeha Enqereyê de, di derheqê min, A. Melîk Firat (kevneserokê giştî yê HAK-PARÊ), Fuad Onen (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ), Sînan Çiftiyurek (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ) de vebû. Ev doza hîn dom dike. **Doza 2-emîn** di derheqê Konferansa Kerkûkê de li Amedê vebû. Di vê dozê de Berdevikê TEVKURDÊ hat dadgeh kirin. Di dadgehê de berdevikê TEVKURDÊ Sebahaddîn KORKMAZ helwesteke kurdî û kurdperwerî nîşan da. Pirsra Kurdistanê û mafên neteweya kurd parast. Di encamê de ev doza TEVKURDÊ beraat kir. **Doza 3-emîn** di derheqê min de, ji bona protesto û rûreşkirina êrişa dewleta tirk li Başurê Kurdistanê, li Amedê vebû. Ew doza hîn dom dike. **Doza 4-emîn** ji aliyê dadgeha Ruhayê di derheqê min, Fuad Onen, Sidki Zîlan (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ), Eyyûp Karageçî (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ), Arîf Sevînç (Endamê Meclîsa TEVKURDÊ), Nadîr Yektaş, M. Kemal Oguzlu de vebû. Ev doza di 17-ê Hezîranê de li Dadgeha Ruhayê dest pê dike.

Di doza 3-emîn û di doza 4-emîn de ezê parêznameyên xwe bi kurdî pêşkêş bikim. Di derheqê min de gelek dozên din hene ku dom dikin, beşek dozên di derheqê min de jî encam girtine û li min ceza hatiye birîn.

Ji bona xebatên Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PARÊ), di derheqê min de li Enqereyê, li Wanê, li Merdînê sê doz vebûn. Min di van dozan de bi kurdî parêzname pêşkêş kir. Ji van dozan **du sal û nîv cezayê** min heye û ez li benda biryara dadgeha bilind im.

Ji bona xebatên min yê Komeleya Kurd a Diyarbekirê (KURD-KOMÊ) di derheqê min de gelek doz vebûne. 3 doz gihîştine

encamê. Ji van dozan **3 sal û 9 meh** cezayê min heye. Ez li benda biryara dadgeha bilind im. Min di van dozan de jî parêznameyên xwe bi kurdî pêşkêş kirin.

Ji bona meşa Amedê û Xaburê jî, min **salek û sê meh** ceza girtiye. Ev doza jî li dadgeha bilind e.

Ji bona axiftinên min yê di konferansan de, ji bona hevpeyvînên min yê di kovar û rojnameyan de, ji bona axevtinên min yê di televîzyonan de jî gelek dozên dom dikin hene.

Armanca dewleta tirk di van dozan de gelek aşkere ye, ji aliyê hemû kurdan û dinyayê de jî tê zanîn.

Dewleta tirk naxwaze ku doza kurd û Kurdistanê pêşbikeve. Dewlet dixwaze ew kesên ji bona doza Kurd û Kurdistanê xebat dikin çavtirsî bibin, ew dev ji dozê berdin. Dewleta tirk naxwaze ku siyaseta wan ya derewîn, kolonyalist, ne mirovane bê deşîfre kirin. Gelê kurd xwediyê mafên xwe yê neteweyî bibe. Kurdistan serbixwe û neteweya kurd azad bibe. Dewleta tirk baş dizane ku dema ku Kurdistan li Rojhilata Navîn bibe dewleteke serbixwe, wê demê rola wan biçûk dibe. Lewra tê zanîn ku neteweya kurd, li Rojhilata Navîn piştî ereban neteweya 2-emîn e. Ev yeka hem dewleta Tirk û hem jî dewleta faris ditirsîne.

Dewleta tirk xwediyê ceribandinan ku piştî serhildanên Bakurê Kurdistanê serok û têkoşerên Kurdistanê hatine kuştin, demeke dirêj li Kurdisatnê bédengî çêbuye. Dewletê bi rehetî siyaseta xwe li ser gelê kurd û li Kurdistanê meşandiye. Xebatên ku welatperwerên Kurdistanê dikin, pêşî li dewletê digre.

**3-Ji bo belavkirin û geşkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê, TEVKURD çi karî dike, çi diweşîne, çi planên we di vî warî de hene?** →